


HEJMAR
30

%100
KURDÎ

PÎNE

ÎMRANLIM ÎMRANLIMI..

KOVARA QERFÎ Û WÊJYÎ




kovara qerfî û wêjyî ya nîv mehî 1-15 ocak (rêbendan) 2001

Sayı: 30

600.000 TL

KLASÎKEKE KURDAN TÊ PÊŞKÊŞKIRIN!..

KOVÎ



PRODUCTION
MOSSAD & CIA

JÎNENÎGARIYA PIRTÛKEKÊ..

Ker mir, bihar hat, qîvar hişk bû; kûsî hilkişyan darê; kevir barîn; qereçî bûn qîzhatûn; dayikan weledên xwe avêtin; gêrik gihîşt hecê; bi gotegot mirov çûn cot, lê piştî pirtûka **Ehmed Pelda*** derket!.. (Sebr bikin, hûnê nas bikin!..) Mala şeytên aval!..

Ehmed, ji bo ku wê pirtûkê binivîse, piştî xwe dide felekê, berê xwe dide oxirê û bi mehan rê dibire; li gelek bajarên welêt li ser aborî û çandîniyê lêkolînê dike. Lê çawa dike?!

Bi serê min û we, **Sherlock Holmes** û xefiyeyên herî jêhatî jî nagihên toza wî û li ber wî solan rast dikin; sola hemû xefiyeyan di şibakeyê re avêtîye!.. Carina gotiye ez rojnameger im, carina bûye lêkolîner. Kurterê, ketiye heft qulan, agahî û çavkanî wergirtine!.. (Kürdistan seninle gurur duyuyor!..)

Carekê, tevî destûra zanîngehê jî, "apê we" nahêlin, ew lêkolînê bike. "Apê me" dikin wî bikin mêvan, lê **Ehmed Kolomb** bi bayê bezê diçive!..

Ehmed, di sala 1993'yan de ji bo pirtûkê dest bi lêkolînê dike û di sala 1996'an de meha rezberê diqedîne; peyre dide ber destê weşanxaneyekê. Lê "weşanxaneyên me" dibêjin, pirtûka me ye, emê çap bikin!.. Dawiyê pirtûk li Beyoxluyê li Kolana Îstîklalê sê-çar salan dide çirtik û lotikan, lê her kes diavêje ber hev.

Di vê navê de **Ehmedê Pirtûkzade** dibê "aclarn ekonomîstî" û bi çolan dikeve; ji her tiştî destê xwe dişol!.. Piştî vê yekê li ser navê Weşanxaneya Çima camêrek tê û dibêjê, "Emê pirtûka te çap bikin."

Îca ji vir pê ve ez jî ketim nav vî filmî. Ehmed ji bo ku pirtûkê bê çapkirin, dîsa li ser pirtûkê sekinî û bi taybetî li ser aboriya **Başûr û Rohilat** agahî berhev kirin. Ji bo ku pirtûka **Qasimlo** ya li ser aboriyê peyda bike, parsekên Beyoxluyê jî di nav de, guhê her kesî qul kirin; êdî li Beyoxluyê her kes **Qasimlo** nas dike!..

Piştî vê yekê, li Aksarayê, Ehmed tevî **Selîm** û **Nasir** pirtûka xwe di ber çavan re derbas kir!.. Selîm û Nasir kî ne? Ew serkêşê garana mişkên me bûn!.. Du mişkên şoreşger bûn, lewre qet kaxiz nedixwarin!.. Dihatin ser sifreyê me; me bi hev re gesta felekê dikir!..

Ehmed bi vî awayî, bi heft kul û belayî, pirtûkê qand. Ew aborînas e, lê ne perenas e!.. Bêrîka wî her tim qulqulî bû; diyar e wê heta hetayê jî qulqulî be!.. Jixwe, wî bi hêkerûn û meqemeyê mîdeya me jî qulqulî kir!.. Me tenê rojekê hêk nexwar, ji ber ku ji ber hejmartina nifûsê dikan ne li ser kar bûn!..


Don Ehmed dawiya dawîn gihîşt mîrazê xwe û xwedê jî xweş lê ani!.. (Ji bo agahdarî û baldariya Kongreya Aboriyê ya Kurdan-Holland!..) Ez nikarim li ser pirtûkê nirxandin û analîzeke zanistî bikim, lê berî her tiştî pirtûkê ji bo ku li ser her çar parçeyên welêt e, zor pîroz û hêja ye!.. (Mîsak-ı Millî dema psikolojik be, bi talûke û xeternak e!..)

Niha ji terîqeta me hin kes dê bêjin, "tu pesna pirtûkeke bi tirkî didî, te doz firot!.." Ne xem e!.. Ez gelekî baş pê zanim ku Ehmed wê rojekê pirtûkên xwe bi kurdî binivîse!.. (Kuro Ehmed, min reklameke baş kir!.. Me rûş neke!.. Ji bîr neke! Te soz da ku tuyê êdî firaqan bişo û hêkerûnê çenekî!.. Ku tu li ser soza xwe nesekini, ezê îmana te biçikînim!..)

* Statîsîz Ülkemın Ekonomı Güncesi UÇ DAMAR İnsan Su Petrol EHMED PELDA 1. Cilt Çima Yayınları

RIZO - DIZO

İMAM cici



DOZO

BİRECAN



MELE

EŞREF MUMCU



SOSRETİK

EŞREF MUMCU



MAM CELAL KENÊ GURAN ANÎ; JI TIRKIYÊ MAMOSTE XWESTIN!..



Li Rihayê 28 zarok, ji ber ku sûcê xwepêşandana qorsanî pêk anîne, hatine girtin. Di nav de kesê di navbera 9-13 salî de jî hene!..

Veli Şaçilik, ku li Girtîgeha Bûrdûrê milê wî hatibû jêkirin, tevî soza dewletê jî hê bêyî milê protez dijî!..



Pirseke gelekî dijwar: Kê pê li bişkoke kir?



Piştî du salan, tevî hemû xebata polîsan jî, komploya li ser Pinar Selekê bi ser neket û Selek serbest hate berdan!..



Di sala 1980'î de kesên ku ji ber sedemên aborî xwe dikuştin %10 bû, îro bûye %69.3!..



Qedexeya li ser turbanê gihîşt ezmanê heftan jî: Li Fakûlteya Îlahiyetê ya Zanîngeha Marmarayê turban hate qedexekirin!..





Ez nizamim gelo hûn jî pê serbilind bûn an na lê ez bi hatina **Birêz û Birêz Mam Celal** ya bo Enqereyê pir serbilind bûm. Heta heta per û baskên min hebûna, belkî ez ji Enqereyê bifiriyama û li **Kurtköy Hawaalanî** daketama jî. Heke hûn pê serbilind nebûne, divê mirov ji kurdbûna we bikeve şikê. Ma çawa mirov pê serbilind nabe malnexe-rabno!..

Birêzê birêzan ji aliyê hemû dewletê ve tê qebûlîkirin; ne leşker dimînin, ne wezîr û ne jî serok-wezîr. Dev ji hemû kar û barên xwe berdane û ketine rêzê ku **Birêz Mam Celal** bibînin. Hûn "begenmîş" nakin, lê niha kî ji we dikare bi wezîrekî re hevdiîtinek çêke? Ma mimkûn e ku **Ecevit** rojekê ji we re bêje "Birêz". Ma qey hûn di xewna xwe de jî peyva "Birêz" dikarin ji devê Ecevit bibihîzin.

Ma ka ew bi we bawer dîke û televîzyonek û dibistaneke jî dide we? Ma ka dihêle ku serokên belediyeyên we bi hêsaniyê bixebitin? Çima? Ji ber ku bi wan bawer nake. We baweriyek baş nedaye wî. Ma ka ferdariya giştî dihêle ku hûn di protokolê de cihê xwe yê xwezayî jî bigirin? Çima? Ê ji we bawer nakin. We ew bawerî di rihê wan de çenekiriyê. Hûn "terorîst" in. Ma meriv bi "terorîstan" re rûdine? Binêrin li **Birêz Mam Celal**, "**en yüksek düzeyde**" me temsîl dîke. Şertên xwe jî yek bi yek dide qebûlîkirin.

Şerta wî ya yekem ew e ku wê Iraq parçe nebe û organîzasyoneke kurdewarî wê li wir çênebe.

Şerta duyemîn wê PKK têk biçe.

Şerta sêyemîn jî Tirkiye ji bo parastina xwe, wê bikaribe li wir bi cih bibe. Ji bo bicihanîna van jî wê dewleta tirk alîkariya teknîkî, aborî û leşkerî bike. Çi bazareke xweş! Ma hûn jî dikarin alîkariyên bi vî rengî ji dewleta tirk bigirin? Tew tew tew... Niha hûn xwe bi xwe dipirsîn ku qezence kurdan li vir çî ye? Ezbenî hûn jî pir "milliyetçi" ne lo!.. Ma di her tiştî de hûn çima li menfeeta kurdan digerin? Hûn jî ji bo **Birêz Mam Celal** tiştêkî bikin, ma wê qiyamet rabe? Hûn nekin jî em hunermendên kurd, dê ji bo wî hin tiştan bikin...

Lê gelo ji bo ku **Birêz Mam Celal** zêdetir bê qebûlîkirin çî dikeve ser milên me? Em hunermendên kurd dikarin ji bo wî çî bikin? Ku **Shakespeare** sax bûya, wê ji bo wî di şûna "**Venedik Tacirîyê**" de "**Silêmaniye û Enqere Tacirî**" binivîsanda. Ku **Brecht** sax bûya, wê ji bo wî "**Silêmaniye û Enqere Tebeşîr Dairesî**" binivîsanda. Wê demê em jî niha straneke diyarî wî dikin... Belkî di pêşerojê de em listikekê jî diyarî wî bikin.

Kerem kin, ji we re strana **Birêz Mam Celal**;
 Bijî Mam Celal bijî
 Em bimirin jî tu bijî
 Bêrîkên me vala bin jî bila yên te bimînin tijî.
 Em kafir û tu hecî
 Em kîvroşk û tu tajî
 Em ne kurd û tu di kurdbûnê de "birincî"
 Em gundî û tu di dîplomasiyê de "firincî"
 Bijî Mam Celal bijî
 "Senî versinler Ecewîte
 bizî vursinler
 Sene Enqere'nin yolları
 bize qûrsinler...."

- Got, "Em ji hev veqetin!.."
- Min negot, "Baş e!.."
- Got, "Ez nema dikarim!.."
- Min got, "Zêde dirêj neke!.."

Bi destên xwe yên mîna siman, destên min girtin. Di par re, di bin dêreyê wê de, min dîvika wê dît; mîna berê nedihejand. Bi çavên xwe yên hûrik, wekî mişkan awir di min de vedan. Ez silikîm. Deng ji min bililya. Peyre dibe ku deh deqîqe an bîst deqîqe an jî nîv saetê bi zimanê xwe hêstirên min malîştin. Bêhtir şil bû rûyê min, bi derbên zimên.

- Got, "Îro yekşem e!.."
- Min got, "Çi?.."



- Yekşem!..

Gava bi bijiyên xwe rûyê min ziwa dikir, yekem car min di dilê xwe de got, "Çendîn bedew e!..". Lê min tenê di dilê xwe de got.

- Got, "Em ji hev veqetin!.."
- Min negot, "Baş e!..". Vê carê negot,
- Ez nema dikarim!..
- Got, "Pelikên te diweşin!.."

Ku min çend heb li ser erdê dîtin, min got, "Dev jê berde!.."

Pisîkên biçûk derketin ji bêrika min; yek jê teliqî. Paşê em ji hev veqetiyên. Dema ku ez di tengekûçeyekê de dimeşiyam, di par re bang li min kir, "Qûnek kurê qûnekan!.."

Dilop



OSMAN OZÇELİK

KOMPÎTUR

Berê digotin, "Keça te heye, derdê te heye." an jî digotin, "Ên ku li keça xwe nedin, wê li çokê xwe bidin." Ma îro ji ku wilo ye!.. Dewr û dewran geriya; her tişt serobino bû. Yekî ku keçeke wî hebe û di ser de jî biaqil û jîr be, keç ne derd e, xezîne ye. **Emperyalîzma Emerîkayê** li ber deriyê her malê derdek daniye. Keçika te ji şîretan an jî ji lêdanê fêhm dikir. Te lê dida diçû rûdinişt, tu rehet dibûyî. Ev derdê ku emperyalîzmê aniye li ber deriyê me daniye, ne bi kuştinê, ne bi hiştinê.

Şairê kurd, talûkeya emperyalîzmê, ji mêj ve dîtîye û ji bo ku bala kurdan bikşîne gotiye, "Dijmin Emerîkan in... îngilîz in... îngilîz... zinhar jê re mebin lîz!.." Şair ji wê rojê de dîtîye ku wê emperyalîst "kompîtûrê" îcad bikin û serê dinyayê têxin belayê. Mala xwedê ava be ku şairê kurd hebû ku bala wan bikşîne û wan ji tofan û bobelatê biparêze.

Dîroknan dibêjin, kurd bi ya pêşiyên xwe nakin. Ez dibêjim ev xeletî û şaşiyêke mezin e. Ma kîjan rojê dîroknan rast gotiye ku li ser vê mijarê jî rast bibêjin. Pêşiyên me çi gotiye me jî gotiye; pêşiyên me çi kiriye me jî kiriye. Wan li ser biznekê malik li hev xera kiriye, em jî wisa dikin. Wan şerê navxweyî û birakujî kiriye, em jî wiha dikin. Xelk bi dû ilm û zanistê ketiye, yên me daye ser rêça şêxik û feqiyên derewîn, em jî. Bi kurtayî wan çi kiriye, em kêmfî wan nemane.

Îro bi saya serê xwedê, bi saya serê pêşiyên xwe, me xwe ji çeka emperyalîzmê ya herî dijwar, ji kompîtûrê dîr xistiye û me xwe parastîye.

Ger pêşiyên cîranên me, bala gelên xwe kişandibûya û ji wan re gotibûya, "xwe ji emperyalîzmê biparêzin û tesel tesel xwe nêzî kompîtûrê wan nekin!" îro serê wan jî nediket teşqele. Yê.

Ger min bi ya pêşiyên xwe bikira û ji xwe re kompîtûrê nekirîya, minê nizanibûya serê xelkê di çî belayê de ye. Ku te kompîtûrê hebe, ne bes e. Divê tu biçî qursa kompîtûrê. Tu çûyî qursê, divê tu hînî îngilîzî jî bibî. Tu hînî îngilîzî bûyî, divê tu bibî aboneyê Înternetê. Ku tu ket Înternetê aha!.. Wê gavê malik li te wêran bû; ne kar dimîne ne şixul. Ji serê sibê heta nîvê şevê, tu pê ve têtî girêdan. Emperyalîst li ser kar û şixulê xwe ne, tu jî li ser kompîtûrê..

Nebe nebe tu, bi dek û dolabên emperyalîstan bixapî û bibêjî, "Ezê ji xwe re kompîtûrê bikirin." Li ser şîreta bav û kalan bimînin... **Kompîtûra te hebe, derdê te heye!..**

PLAN Û PROJÛYÊN NÛ!...

- Ji welêt tenûreke çêkirî bînin û dîyarî diya xwe bikin.
- Bi kurdî "Özeleşîrî" ya herî mezin binivîsînin û bikevin nav **Rekorên Guinnessê**.
- Di înternetê de li ser navê evîndara xwe, malpereke kurdewarî ava bikin û tê de krîterên nazdarî û hezkirinê biweşînin.
- Li **başûrê Kurdistanê**, sê mehan bibin Ombudsman û dû re li rengê mîza xwe binêrin.
- Xwe **Mesîhê Dawîn** îlan bikin û bêjin "Kengê ku kurd giringiya zimên, çand û hunerê fêr bikin, roja haş û mahşerê hingê ye."
- Bemameya dilê xwe çêkin û ji gerîndeyê **Medya-TV** ye re bişînin.
- Komeleya tiral û rexnegiran ava bikin û bursê bidin aqilfros û rexnekujan.
- Ji romana Hêlînê filmekî nemir çêkin û rihê **Mahmûd Baksî** şad bikin.
- Nîfirên pîrîka xwe, bixin nivîstî û ji **Rahşan Xanimê** re bişînin.
- Di nav mala xwe de li gorî pîvanê xwe partîyeke ava bikin û heta hetayê bibin serokê wê.
- Berî mirina xwe helewa xwe belav bikin û mîrata xwe jî ji **Xaltîka Pîneyê** re bihêlin.
- Li ser rojeva firaqşustin, xwêşdank û çopên tijî civînekê çêkin û bo dîn û îmana kamil çend bîraran bistînin.
- Wê hevalê/a ku we **'boşa çiqarmîş'** dike, sê-çar meha bikevin pey û kêmasiyên wî/ê **'yaqalamîş'** bikin.
- Li deşt û çiyayên xwe gur, kûsî, kule û mar û mişkang bigirin û ji **Navenda Lêkolîn û Lêgerînan a Osman Dûrmûş** re bişînin.
- Herin ber Dîwarê Qudûs'ê yê Girînê **Mewlûda Mele Ehmedê Batê** bixwînin û bo aştiya navxweyî û navneteweyî diayan bikin.
- Pirtûkên ku we ji ber tiralîya xwe nexwendine, ji saziyên **"BÖLGE"** ye re bişînin.
- Ji operasyonên Wezerata Karê Hindurîn re, hin nav û nîşaneyan peyda bikin.
- Teorî û pêşniyarên xwe yên bi kêrhatî, bifroşin saziya cihê pratîkê.
- Mirîşka Emînê Çolajan bikujin, bikevin girtîgehê û fêrî ziman û çanda kurdî bibin.
- Li ser têgihên aşî, biratî, demokrasî, azadî û wekhevîyê ferhengokêkê çap bikin û li ser pira rojava û rojhilatê belav bikin.
- Bo fêmkirina tirkî ji xwe re tercûmanekî/ê peyda bikin. (*Bu bî devrîm heval!!!*)
- Ji dilsoz û 'ahbap û çawîş'ên xwe re mektebekê ava bikin û dersên mûrdîbûnê bidînin.
- Makêta goristana gundê xwe çêkin û ji **H. Samî Turk** re bişînin.
- Ji ernê xaltîka **Medenî Ferho** re, pênc cilt romana xaltîka xwe binivîsînin û wergerînin pênc zimanên din.
- Tenê pênc rojan, rojnameyeke bi kurdî ya rojane derxînin û bikevin dîrokê.
- Ji xwesûya xwe re rêxistînekê ava bikin û ji gîlî û gazindên wê xelas bibin.




EVDILE KOÇER

ŞEKIRÊ QULQULÎ

CEM ŞEKER



YABO HINEKÎ BILEZÎNE!.. EY HEYWAN LI SER MÎN QEYDKIRÎ NE!.. KU PÊ BIHESIN, EZÊ JI KARÊ XWÊ BIBIM!...





FİLİSKE...

Rocê yêna ez an sûkê ra ancenan sonan. Cayê ra şiyayîş mi rê zê merdîso, zê zulim o, bêter o.

Pêyniyê xo ra caverdanan nêzanan...

Çiyê min çîno...

Kesê min çîno...

Vengê fîlîskayê mi ra ber dirbetê min esto. Xor xo rê vanan aye kî piya me bêrî.

Me bêrî hama kamîrê caverdî. Kotî di caverdî. Na taw kam derdê kamî cêno xo ser, kam dirbeta kamî ra mêmedar beno...

Henî aşîno kê her çiyê xo piya benan...

Fîlîskê xo kî...

Dirbetê xo kî...

Verde ez rew rew ca vumênê ya. Sûkanê dotandê, sûkanê şarandê mandênê.

Cayê ra kê şiyênê cayê bînî xor xo rê helbestan (şîir) kî nûsnênê. Vanan nika kî binûsnî, hama nêşikînan... Vindênan, yênan-şonan, çerexînan nêşikînan daba binusnî.

Çayê niyawo, nê zanan...

Be kî zanan kî...

Rey rey xor xo rê vanan mi şikîte. Zerê mi şîkiyo.

Çayê vanêsa, pers kenêsa...

Hênî yo...

Kam mi rê se kerdo, mîrçikê min çayê pero şîyo nêzanan hama zerê mi şîkiyo.

Hama anca kî şîkînan tenê tenê nusnenan. Jû (yew) helbestî kî nika binusnî:

sodir biyênê

vengê qersunî biriyênê

şiliyî tenik varênê olaxanê ma

ez rişiyênê

ez binê buriyanê xo dê vilayiyênê

vilûka min

omeda min

sara min

mayî şiyênê

piyî şiyênê

layikî şiyênê

çenekî şiyênê

mabênê buriyanê mi de

îştîrî şiyênê şiyênê şiyênê

wertê locinan dê adir nemandênê

Rind nêbî hama nika hentê bes o.

Me qariyê...!

Vajerê kê fîlîskê cinitan...

Şîma qe fîlîske nêcinenê?






AYY!...
WEY LI MIN!...
AXX....
XALO, TE HER SÊ BI HEVRE DUCAN" KIRINE!.. KA TU BÊJT, EZ JI KIJANÊ DEST PÊ BIKIM!..

XHAMILE BIRAKMAK.



FERMO EZBENÎ!.. TU ÇI DIXWAZÎ?!..

ING!..



PISMAM!.. BERÇAVKA TE LI KU YE?

KURO, EZ ÊDÎ LENSAN DIKIM ÇAVÊ XWE!..



HEYRAN, KA CAREKÊ LI VÎ BINÊRE!.. XWELÛSERO TIM LI PAŞ DIMÎNE!..

SAETSANZ



GIRARA QEREGYAN

GIRARA SERSALÊ (2)

Me soz dabû we ku emê çend kevçiyên din ji girara demokrasiya welatê xwe birêjînin. Vêca, ji ber ku ev girar li kolanan belav bûye û her der dagirtiye, emê tenê çend kevçiyên biavêjiin ber lingê we.

Yek ji encamên wê va ye li ber çavên we ye; ku bandora wê gihiştîye *Emerîkayê* jî. Li cem me, carê ku mirovek dibe serok, malnexerabo bi kursiyê ve dibe benîşt û canê wî bi wê kursiyê ve dibe yek. Gava mirina wî tê, ji berê ve ew hesab kiriye, di cih de, lawê wî tê dewsa wî.

Vêca *Emerîkayê* jî çav li welatê me ket û got, "Çima em kêmî wan in bavo!.." Ji ber vê yekê lawê serokê xwe yê berê *Corc Bush* ajotin ser kursiya serokatîyê. Ka em dev ji kursiyên berdin û berê

xwe bidin k

Di tehqîq biborin, xw ku çil sal li dibû ji min te bi "Mêr Min got, "T ango xwed

Awir di got, "Yanî naskirî dibê Yanî l' ser berpîrs. Her bû. Heta bi li ser sero jixwe pê re ran got, "es

Piştî rah *Bilind*" û got me nivîsand hetî mam. kir, "Ev çar berpîrs û m nên tu qala mûsa me ne peyda nekir, la namûsa me

Bi rastî de

TABLÊTÊN



QUZILQURTY MEJI EFRÛQ JI TERE MÛZAN LI TE BIGIVIRE QRALÊ MIN!

hev; ne ji tirsan re, ji ber jîrbûna wî. Di bin çavan re li min dinêrî û berdewam dikir, "Nebêje em ker in!.. Ji luxz û sembolên te em fêmanakin hal!.."

Min dîsa got, "estexfirullah". Lê wî îca got, "Xem nake tuyê vê tenê rast bibêjî!.. Min serê xwe hejand û wî got, "xwediyê vî sûrê tê li ser bergê pirtûkê kî ye? Xu-yaye ew jî yekî wekî te, hingî bi namûs e, çim mîmên tazî çêkirin!.."

Min bi kurtayî bersiv da, "Salvador Dalî yel!" Wî got, "Ew jî kurd e ne?" Min got, na. Wî got, "Nexwe tu ji ku wî nas dikî?" û rahîst pênûsê, "Ka adrêsa wî bide min!.. Li Spanyayê yel!.. "Xem nake... Xem nake kanî adrêsa wî!.. Miriye. "Xwedê rihê te bistînel!.. Ew kengê mir?" Ez li bersiva xwe ya rast poşman bûm. Ji ber ku wê vî camêrî ferman dabûya çend leşkeran da ku herin Salvador Dalî jî bînin hepsê. Û çend dersên li ser demokrasîyê, wekî ku dane min-bidana wî jî.

Belkî Dalî jî, berî mirina xwe, ji vê girara rij û kelê bêpar nemabûya!..

yên biçûk.
de, kursiyekê,
yê kursiyekê
derê qedan-
rsî. "Mebesta
Avis" çi ye?"
ek û avis bû
re xera kir."
de vedan û
li ser kesekî
Min got na.
textê. Kursî,
rsiva min, na
got, "Yanî te
nivîsandiyel!.."
min deh ca-
firullah".
"Jinên Qatên
te li ser jinên
ne?" Ez be-
berdewam
silind, cihê
an e û ev ji-
n dikî jî na-
ca te tu kar-
bilî ku tu qa-
bikî."
yê min kete

BEREDAYÎ

ÎCA MÛZÊ EFRÎQAYÊ LI MIN
KÊM BÛN!.. WE HER TIŞT DABER
MIN Û AXIRÊ FERQA MIN Û GA-
MÊŞAN NEMA!.. EZ JI DILQÊ
MIROVAN DERKETIM!.. EZ ŞERM
DIKIM DERKEVIM NAV MIROVAN!
KA EM VÎ GÛYÎ JÎ BIXWIN! DE
DAWIYA MIN WÊ ÇAWA BE?!..



HEŞ • BAOJ



* LI WANÊ QELEN BI TEQSÎTANJÎ TÊ DAYIN ÊDÎ!..



MIZGÎN!

PIRTÛKA KU EV 100 SAL E HÛN LI HÊVIYÊ NE DERKETI!.. MIZGÎNA XWE DIXWAZIM (NAVNÎŞANÊ HÛN DIZANIN DI RÛPELA 14'AN DE DINIVÎSE.) PIRTÛKA SEYFÎ QÛNMEZIN JI BAYIYA BIXWAZINI! KU GOTE TUNEYE, HEVALÊ XWE BERHEV BIKIN Û DEV Û POZÊ BAYIYAN BIŞKÊNIN.

KÎ BI SERÊ POZÊ XWE LI PIRTÛKA SEYFÎ QÛNMEZIN BINÊRE, EZ DI GORA BAVÊ WÎ... (ORHAN PAMÛK)

PIRTÛKA HEVALÊ SEYFÎ NAVA MIROV VALA DIKE. HA TE TIR KIRE, HA PIRTÛKA SEYFÎ!.. HER DU JÎ WEK HEV INI!.. (YAŞAR KEMAL)

Ê KU MÊR E, DE KA BILA PIRTÛKÊ REXNE BIKE. WELLE XWEDÊ JÎ NIKARE WÎ JÎ DESTÊ MIN XELAS BIKE. YÊ REXNE BIKE ORISPÎ ÇOÇXÎ YE!...







KU EZ JÛ NEBÎM
MA TUYË ÇI BIKÛ
HULHULIYO?

KA BËJE!..
DÛSA KÛJAN BË-
BAV Û XAYINËN
TERES SERË ME
DIËÛININ?!..




PIÛTÛ PËNC DEQÛQEYAN..

XEM NEKE
BERXË MIN!.. MIN
TU FËM KIRÛ?EZE
VË MESELEYË
SAFÛ BIKIM!..


SPAS
EZBENÛ!..



HEM EM XWE PË
NAWESTÛNIN?.. TU CEÛSAN
NAS DIKÛ? TU NAS NAKÛ, LË
KURD BAÛ NAS DIKIN?.. JÛ
BÛR NEKE, KURMË DARË JÛ
DARË YE!.. HÛÛ... HÛÛ... HÛÛ...



VAYE EM GIHÛSTIN
DARÛSTANË!.. EV DER ZËDE NE
EWLE YE!.. HAY JÛ XWE HEBE
HEYDO!.. EZ PËTNA DIJMIN
HILTÛNIM!..



HIMF... HIMF... KURD
EV NE DIJMINË!.. LI MIN
XERÛB NAYË!..

KURD
TU ÇI DIKÛ?..

EZ NIKARIM
DEVERÛ DIRËJ
BIM, MA TU PË
NIZANÛ?



HOOO LI
HEHYAAA.. LI
LËXIN
LA HO!
LËXIN!..

HIHI HIHI!..



BAÛ E
MAMCELAL?
EM ÊRÛÛ
NEKIN?..

ZÛ ÊRÛÛ
BIKIN!.. MA HÛN
LI HËVIYA ÇINE?..
588... 599... 600...

Çima?



KOMKUJIYA XEWNÊ

Pencereya Peyvê



ahmad.hussayni@nefel.nu

EHMED HUSEYNÎ

Ne bi xwe re bûm
Ne jî li sîbera hevrêyan ewle dibûm
Dilê min hildiperikî kelehên ji gulavê
Neylovara ku min ji sînga te re
bi matmayînê av dida,
bû kefenekî ji dûmanê û
ber bi keviya şevistana "Olempê" ve çû,
de bizanibe ey qonaxa tirsê ku
reşgirêdan ji xwe re hilbijart!
Gavên me li kaviên xwe dibaniyan û
Sînorên me mija xwe dikuştin.
Reşebayan em nêzî hev dikirin
û stêrkên xewnê rêçên me bi xwîna dîrokê diçûrisandin.

Destên me ji meya gezo bûn,
tiliyên me jibermayên çîroka azadiyê
ji şengebiyan re digotin
û di bagera xapînok a bakur de
û di barana ku hê jî nebariyaye ya başûr de
Di neynika tozgirtî ya rojhilat de
Di çemên rojava de,
Çemên ku ji bo xelkê diherikin,
Li wir,
li vir,
li cihê ku ez û tu bûn welatekî ji êgir
xatirxwestin li ser lêvên min û te wek ku nejiya,
mir.
Bijîd

Ey nexşeya bêxwedîmayî
Çendîn dilovan î ku dayikan
li ber dergûşan dilorîn!
Bijîd
Ey sirûda Habîl û Qabilistanê,
Çendîn şareza yî
ku tu me bi kêrên xewna hevrêşimîn dimirînî?!
Her ku xwe bavêjim bextê bişkojên zikreşiya te
bijîd!
Her ku serê şevê li ser balgeha perçebûna te vehesînim
bijîd!

Her ku qebqeba kewê xwe
bi ser kevirên dastana birakujîya te de birijînim
bijîd!

De min jî bikuj ey welatê rij!
De xwe jî bikuj ey welatê dij
Xwêdanê, helkehelkê, jenê, qublenameyan û
şaneyan û hespên bêdeng jî bikuj
ey welatê xwînrîj!

DIYALOGÊN SIST seraf MUMCU

- BOZO ABÊ, DESTÊN TE PAQJIN?
- BELÊ, ÇIMA?
- WERE SIMBÊLÊN MIN BADE HI-HAHA!
- Ê YAWŞAQ!.. PIŞTÎ TE EV MÊRANÎ KIR, QENE NEREVE!.. ÇIMA DIRVÎ? OXLIM, EV ÇAYLAXÊ MÎ-LENYÛMÊ BI DU DÛMANÊ CIXAREYÊ ÇELQ DIBIN LO!.. ÎCA ÊDÎ BI GUNIKÊN ME JÎ DILÛZIN!..
- DEV JÊ BERDE BOZO ABÊ!.. EW ÇI BIKE, WÊ JI XWE RE BIKE!.. QEY ROJÊN XWEDÊ XELAS BÛN? BI



EW HEVALÊN NAMBIRVANI!..
EW DOSTÊN PANASONIC 6D30
HÛN ZANIN EZ HUNERMEND IM Û DIKARIM DI NAVA 3 ROJAN DE PIRTÛKEKE "YANDAN ÇARXLÎ" BINIVÎSIM
WEKÎ GUNIKÊN BAVÊ XWE ZANIM KU WÊ BIBE BEST SELLER
WÊ MIŞKÊN DI QULAN DE PÊ BIHE-SIN Û PESNA MIN BIDIN
WÊ BÊJIN, HELAL BE JI TE RE EY HUNERMENDÊ HÊJA!..
LÊ DITIRSIM TU BÊJÎ ÇIMA?

Ê HÛN BIRAYÊ ZEYNÊ ZALIMEK ORISPÎ ÇOCIXÎ DIKIN HESÊB? NAI!..

WÊ EW Û HEVALÊN WÎ, ÇE-TEYÊ AVA BIKIN Û PIRTÛ-KÊN MIN ÊN KORSAN BIWEŞININ
Û LI KUÇEYÊN STEN-BOLÊ BIFIROŞIN
ÇIMA? JI BO KU EZ TO-PÊ BIAVÊJIM.

LOMA EZ NAWÊRIM EY DOSTÊN PIRPIRLÎ

ŞEREFÂ HEÇÎ, EZÊ GOŞTÊ WÎ HÛRHÛR BIKIM Û BIAVÊJIM BER GURAN!..

- KURO GUR JÎ GOŞTÊ WÎ NAX-WIN WELLEH!.. YÊ KU BIXWE, WÊ BI NEXWEŞIYA DÎNAN BIKEVE!..
- ABÊ HELBESTEKE MIN HEYE, KA JI TE RE BIXWÎNIM. MIN DIL HEYE JI YARIŞMAYÊ RE BIŞÎNIM. GUH BIDÊ:

BIRAYÊ ZEYNÊ LAWIKEK QALLES ZALIMEK ORISPÎ ÇOCIXÎ

EW BIRAYÊ WÊ KU BIRÇÎ BIBE Û JI DESTÊ WÎ BÊ, WÊ DIYA XWE DERXE BAZARÊ ERZAN ERZAN BIFIROŞE

EZ LOMA BELENGAZ IM EY HEVALÊN LOLILOP'

- LAWO, MA EV HELBEST E? TE MALA ME XERA KIRI!..

- ABÊ MIN JÎ GOT, QEY TU JI ÇAND Û HUNERÊ FÊM DIKÎ!.. WELLEH TU LI BER ÇAVÊ MIIN BÛYÎ SIFIROXLÎ SIFIR!..

- KUNDIR MA DI KÎJAN HELBESTÊ DE HELBESTVAN QALA BIRAYÊ KEÇIKÊ DIKE? QEY EV BORIYÊ LAYÊ MIN!..

- ABÊ KÛSI!.. BI MIIN RE XEBER NEDÊ!.. TU LI BER ÇAVÊ MIN REŞ BÛYÎ!..

- SIKTIR BE LO!.. QEY EZ MERAQLIYÊ TE ME!..

XAÇETERS

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	3	6						
2				1				
3								
4						9		7
5								
6						4		
7							2	
8		5						

1-Paşnavê hunermendekî nemir!.. Dengzîtirîn stranbêjê Kurdistanê bû. Wî jî wekî gelek hunermend û rewşenbîrên kurd tenê û şerpeze koça dawîn kir. Ku em bibêjin "Ay Gulê" wekî ku navê wî ji we re gotibe. - Tîpeke futbol û basketbolê ya Yewnanistanê (Nebêjin ev pirs ji ku derket!.. Êdî spor jî bû karekî neteweyî heval!..) 2-Cînavkek (Ev pirs ji neçariyê dikevin xaçeteresê!..) - Bajarekî başûrê Kurdistanê (Heya em li tatîlê neçin parçeyên din ên

welêt, Mîsak-i Millî wê serketî bel.. Bimre Parçeperestî!..) 3- "Metropol Çociqler" vê pirsê nizanin! Di nava zeviyên de şîrînê û mala wê xera dike; reşk, zîzan 4- Neteweya kurd her û her ji dil û kezebê yêrî kûr dikîşîne; cîranê keserkişandinê!.. - Ev jî pîrseke singîner e. Di nava behrê de û li keviya wê peyda dibe. Bi taybetî havînê gelekî bi kêr tê; xîz. 5- Dîn û ilmê sed sala me; her kesî dev ji zanîst û aqilmendiyê berdaye, li gorî wan dimeşe. Xemrevîna mirovên aşbetal û ku ji rastiya xwe direvin. - Îro êdî qet peyda nabe. Yêrî ku peyda dikin jî nano ziko dixebitin. 6- Êdî kes ji hev re nabêje; guhê deviyên hene. Destebirak û destexwişkan ji hev re digot; sir, nehên. - Sewaleke mîşin û baqil. Dam û florta berên. 7- Helbestvan û rastbêjekî tirk. Xeyyamê sed sala me bû. Neya wî her tim li ser lêvên wî bû. (Xwedê bi meya xwe wî şa bike!..) 8- Amûreke muzîkê. - Me nedixwest vê peyvê bixan xaçetersê, ji ber ku yekî tîne bîra we, lê ji neçariyê çêbû. Vê dawiyê li Enqereyê bû: Pere pere pere...

★★★

1- Pişe û meslekeke gelekî kevn e. Kesên ku vî karî dikin ji qal û kurtêlan pir hez dikin. Bi taybetî di nava seray, meclîs û partiyên siyasî de peyda dibin; şalûs, melaq. - Fêkiyê havînê ye. Mirov li ser darê bixwe çêtir e; jê dims jî tê çêkirin. 2- Di menûya heywanan xwarina sereke. - Dema em zarok bûn, şer û pevçûnê me piranî li ser van bûn. Gava me peyda nekir, me ji kevîran çêdikir. Yêrî ku pê nelîstibin, wê tu caran nikaribin bibin mirov. 3- Bi xwedê nivîsandina vê pirsê li me giran tê. Keça roj û hêviyê!.. Xudawena Azadiyê. Li Dêrsimê bû kulîlk û li her derê welêt şîr hat!.. 4 Dema çêlek û gamêş dikevin stresê dikin. Halan û slogana wan. - Feqîr û belengaz vê peyvê baş nas dikin. Lewre îmana wan çikandîye. Hikûmet wekî tu karî nake, bes dike. 5- Bi soranî av (Tenê herfek cihê ye gidîno!..) - Quran em nizanin vê pirsê çawa binivîsin; carna ji dêvla vê ve dibêjin, an. 6- Tekane îdeolojî û baweriya rast û mirovane!.. Hemû mirov di rastiya xwe de afgîr û tarafdarê vê îdeolojîyê ne, lê ji ber hatine çewsandin û dewsandin, jê dûr ketine!.. Apê Bakûnîn pîrê wê ye!.. 7- Bi kurdiya nû dibêjin heman - Cînavkek. 8- Li gundan gelek caran "karê şevê" li ser wê tê kirin; doxînist gelekî hez jê dikin. Doşeka evîndarên îlegal. - Kîjan kêr tîne sûtin an jî seqakirin. - Hezar caran ji "belê" girîngtir û rûmetdartir e. Yê ku nikare bêje, ne xwedî kesayetî ye û ne jî azad e!.. Azadî û serketin bi vê peyvê dest pê dike!..

PEYVA ÎLEGAL → 1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 U D

Deh kesê ku peyva îlegal bibin û bişînin ser navnîşana Pîneyê, wê kasetaya HOZANÊN XORESANÊ qezenc bikin.

Kesên ku peyva îlegal a hejmarê 28'an "Mehabad" dtin û kasetaya Seid Yusif qezenc kirine ev in: Serhat Yazar/Mûş - İbrahim Ateş/ Semsûr - Barış Abışak/Sêrt - Nedim Şahin/Melefi - Ulaş Başboğça/Qoser - Muhammed Yıldız/Batman - Gülcan Demir/ Elmanya

Ji Weşanên Welat bixwazin

Amed
Kıbrıs Cad. Türk Hava Kurumu Apt.
Kat 4. Tel: 412 223 34 83

Wan
Belediye İş Merkezi
Kat 1. D 106
Tel: 0432 215 64 26

Batman
Yeni Mah. 711.Sok.
No: 27 Kat 2
Tel: 0 535 319 46 15


Riha
Kunduracılar Pazarı. Özpolat İşhanı. Kat 3/5
Tel: 0414 216 81 07

Edene
Kocavezir Mah.
Karacaoglan Cad.
Aziz Pamukçu İş Merkezi
Kat 3. No: 23
Tel: 322 351 42 78

İzmir
1420 Sok. Koyuncular
Apt. No. 12. Kat 5.D.5
Kahramanlar
Tel: 232 446 19 50

Mersin
Çankaya Mah. 4709 Sok. Eser İşhanı Kat 1.D. 5
Tel: (0324) 237 66 49

Kerem kin, li axaftina Serok û Sokrates guhdarî bikin!..



DERKET

Kovara panzderojî (Onbeşgünlük Dergi)

■ Xwedî (Imthaz Sahibi) M. Nuri Karakoyun
■ Koordinasyon Gişî Sami Tan
■ Lijneya Weşanê (Yayın Kurulu):
Mazlûm Doğan, Doğan Güzel, İmam Ciel

■ Berpîşyarê Karê Nivîsaran
■ (Yazı İşleri Müdürü) Abdurrahman Pekedis
■ Navnîşan (Yönetim Yeri) İstiklal Cad. Ayhan
İpek sokak.19/1 Beyoğlu/ İstanbul

■ Tel: (212) 292 72 70
■ Fax: (212) 251 95 85
■ E-Mail: pinedank@hotmail.com
■ Kargerî (kicare) (212) 251 79 37

■ Çapxane: Aspaş Matbaacılık.
■ Yayın Koordinasyon
Ada Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd.Şti.
■ Belavîkirin BIRYAY Dağıtım

■ Nûnergeh: Edene: (322) 351 42 78
■ İzmir: (232) 446 19 50 Mersin: (324) 237 66 49

BEQ Ên destê sibê hatine dinyê



Hûn hestên xwe yê nîjî û tîsî, wekî sloganê dinivîsînî û dî re ji herkesî dibêjin, "Va ye ez jî helbestan dinivîsînî..." Serpêhatiyên ku hûn dinivîsînî jî, wekî çîrokên nûjen bi me din "daqurtandin." Û di ser de jî hûn diçin, niqaşên li ser zîman û edebiyata kurdî, bi tirkî dikin. Hûn ne serm dikin, ne fedî... (Malnemîrat qet nebe etika mêrê berê bizanibin.)

QUSXANE Ên berî nivro...



Mîrê'm!!! Vêga hûn rêveberê saziyeke girîng in. Wekî ku cenabê we jî pê dizane, wê gelek tişt bi destên we bêne guhartin. Hewidan û xîretkêşiya we, wê bo pêşketina civakê roleke mezin hilgire. Mixabin ku, dîroka malkambax li ber keviya we tê nivîsandin. Nebêjin "Ne soylemek îstiyon heval!!" "Bu anlamda" divê ji serî heta binî hûn xwe biguherînin, nexwe wekî din 'qurtarmîş' nake.

MOZ Ên piştî dana pez



Van rojan, nexweşiyeke we, bi emeliye-teke mezin, derbas bû. Ew nas, dost û hevalên ku we hevî dikir ku wê werin serdana, yek jî nehat. Ma em dikarin derdê we jî hilgirin. Ji bo ku haya pê biketa, divê we îlanek bidaya MEDYA TVyê. Ji vir û pê ve, nas û dostên xwe li gorî Şartnameya Yekîtiya Ewropayê hilbijêrin. An jî serê xwe bo miniyên ku hê dijîn, neêşînin.

CASIK Ên ber êvarê...



Çiqas ku hûn hevalekî xwe dibînin, wekî mebûsan jê re dibêjin "Heval tu qet pîrsa me nakî, qet nebe mirov carekê telefon dîke!" Hûn ewqas dilsoz bin, hema hûn pîrsa hevalên xwe bikin, ma wê kevir bibarin. Ma kes mecbûr e ku pîrsa we bike. (Kim oluyon lan!!!) Hûn nabêjin gelo ka birçî ye, tazî ye, nexweş e, bêtal e, heqê telefonê heye an na?... Êdî bes e heyran!.. Serê hevalên xwe neêşînin. (Hadê Yallaah, biqêştinnn...)

ZIRNE Ên nivê sevê...



Hûn nû ji girtîgehê derketin: Bo pêşketina çand û zîmanê kurdî niha li saziyekê dixebitin. Em dizanin, bawerîya we xurt e, lê dîsa jî hinek tişt li gor xweziyên dilê we naçin. (Ma xweziyên kê li gorî dilê wî/ê çûne!..) Ji bîr nekin ku hûn dareke mezin diçin, eger hûn xebateke bi rêk û pêk nemesînin, wê ev dar tu carî jî şîn neyê.

HUDHUDK Ên heft mehi hatine...



Hûn qewimîn û bûyerên dinyayê li gorî berçavka xwe şîrove dikin. Azadî û demokrasiya ku hûn qal dikin, bi tîra teyrê demsale jî nake. Ji kerema xwe û bavê xwe re, îsal derbarê tiştê de şîroveyan nekin û zikê tu kes ne-werimînin. Pêşî herin mûyê pozê xwe hil bikin û dî re bo pêşeroja zarokên xwe tiştêkî bikin.

Midûrê me yê firaqşo ji Girtîgeha Amedê radigihîne:

Ez li vir rehetir im!..

Li girtîgehê min deh roj pîr kirin; wisa xuyaye ku ezê hê gelek rojan pîr bikim. Qey ev tiştêk e, li cihê ku lê kesên ku 2 hezar roj pîr kiribin, hebin!.. Bêguman ne tu tişt el..

Deh rojên pêşîn ez li hêviya bersiva fîraza xwe ya ji bo serbestberdanê mam. Ma ez tenê li hêviya bersivê mam? Na!.. Ji ber ku deh rojên pêşîn "midûrtiya" min pere kir,

Ji zû de min destê xwe ji karên wekî firaqşustîne şustibû. Wekî ku tê bîra min di sala 1998' an de ji bo ku aspêj tunebû, me li rojnameyê bi dorê xwarin çêdikir; her roj du kes nobedar bûn. Wê demê jî ji bo ku ez firaqan neşom, min karê çêkirina xwarinê hilgirtibû ser xwe.

Min xwe qurre dikir û firaq neşustin. Ne ku ez neheq bûm; ma li

yan!..

Bi xwedê û Qurana pêxember xwendî, ez li vê derê ji derve rehetir im!.. Lewre problemên aborî yê ku îman li min diçikandin, xew li min diherimandin li vir tune!.. Kêfa min saz e; ji gurê pîr jî sazîr el.. Ez dixwim, vedixwim, dixwînim û bê tîzbî pêgermokê (volta) digerinim!.. Heta niha min du pirtûk qedandin,



FLAŞ... FLAŞ... FLAŞ!.. PAPAŞIYÊN PÎNEYÊ WÊNEYÊ MIDÛRÊ ME YE TOP SECRET PEYDA KIR!..

nehîştin ez dest bidim karên wekî firaqşustîne; min kêfa gurê pîr kir!.. Lê piştî ku operasyona ku navê "vejiyandinê" lê hatibû kirin, dest pê kir (di rastiyê de bû komkuji), hevalên me yê li qawîşê ji bo protestoyê dest bi rojiyeke 5 rojî kir.

Li ser vê yekê min û cigirê Şaredariya Mezin ya Amedê Remezan Tekîn, me xwe li ber teştî firaqan dît!.. Em hem dixwin hem dişon. Ne midûrtiya min ne jî cigirtiya Remezan Tekîn mal!.. Ez bawer im ji bo ku em her du jî firaqan gelekî baş dişon, em bûn xwendî pişseyeke (meslek) nû; yanî firaqşotî!..

Ez bawer im li welatekî ku bi milyonan betal û aşbetal heye, hûn jî girîngiya kar û pişseyeke nû fêm dikin. Lewma hem ez hem jî cigirê serok, em xwe gelekî bextspî û bisi-ûd dihesibînin.

ku derê hatiye dîtin ku midûr firaqan dişon!.. Ji bo ku bê dîtin, min tenê rojekê firaq şustin. Hevalan jî wêneyê min kişand û li rojnameyê daleqand. Min her roj ev wênê hil-dianî, lê Hevalê Samî her car yekî nû derdixist, lewre min dev ji hilanîna wêne berda. Cara dawîn li ser qaseya pereyan bû; hem jî bi pêştîmal û têr kefdar. Lê li vê derê midûrtî û cigirtiya şaredar ne xema kesî ye. Li vir, heval tenê û tenê, pîvan û prensîpên adalet û wekhevîyê dimeşînin.

Li vir rojname û kovaran cara dawîn ez dixwînim!.. Ka hûn li rewşa min bifikirin: Yekî ku midûrtî kirîye, gelek tişt berî her kesî dîtin, talîmat dane û bi talîmatan tişt dane anîn, îro ketiye çî halî!.. Ez di dilê xwe de dibêjim, "heft xwezî bi rojên berê", lê bi xweziyan mirov nagihê kezi-

a sêyemîn li ber qedandinê ye!..


Bi serê we û min, ku li vir televizyon tunebûya, çêtir dibû. Lewre bûye derewdank!.. Gerçî em bi kêfa xwe ne; em dikarin lê temaşe nekin. Lê bi hêviya ku em ji van derewan du-sê rastiyan hilçînin, em guh li televizyonê didêrin!.. Ger me lê temaşe nekira, me hay ji rewşa girtîya ku digot, "Bi saxî em şewitandin!.. Şeş jin bi saxî şewitandin" nedibû.

Mirov bêhtir bi gotinên rojnamegerên piştî ku "Andîç" derket holê, gotin, "Em xapandin! Dewletê em xapandin!.." diqehire!.. Kesên ku wisa gotin, îro dîsa piştî dewletê digirin; bûne berdevkê şerê psîkolojîk!.. Lê em xeman naxwin!.. Wê rojekê dîsa bêjin, "Em xapandin!.."

Ligel Silavên Ş. (Yanî şoresgerî; ji ber ku nivîsandina peyva şoresger qedexe ye!..)

*Xwendevanê hêja û nehêja, Kovara we ya fûl-otonom KUNDIR derket tafla xw e ya sedsalane ya bêpere!.. İca wê dîsa kengê derkeve xwedê jî nizane!.. Heya wê demê ev quncik ê we ye!..Lê name û nivîsên mîna TRT û daxwaznameyê (dilekçe) nenivîsin, ji kerema xwe re!..

FFFF!



A. ÇİÇEK * CİCİ